Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :889 15-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165



## Perwerdeya çandê ya 22 jinan



Ji bo zindîkirina çandê, Hîlala Zêrîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê dewreyeke perwerdeyê bi navê Şehîd Arjîn Amed li Akademiya Şehîd Bawer ya taxa Mişêrfê ya bajarê Hesekê da destpêkirin. Dewreya Şehîd Arjîn bi tevlîbûna 22 Endamên Hîlala Zêrîn 3'yê Tebaxê dest pê kir.

Endama Hîlala Zêrîn ya Kantona Qamişlo, Bera Ferec Hesen dibêje, hêza jinan bi perwerdeyê xurttir dibe; "Ev cara duduyan e Hîlala Zêrîn dewreyên perwerdeyê di asta bakur û rojhilatê Sûriyeyê de vedike. Bi rastî gaveke pîroz û serketî ye û şansek e ku pê em dikarin xwedî li çand û dîroka xwe derkevin. Perwerde di nava jiyanê de pir girîng e, ji ber ku lêvegerek e. Dema mejî birçî yan tî dibe, pêwîstiya wî bi zanebûnê heye, ev zanebûn jî bi riya perwerdeyê tê. Eger em dîrok û çanda xwe nas nekin, emê ti carî nikaribin bi ser bikevin. Lewma serokatiyê li ser perwerdeyê pir israr kiriye û her tim bangewaziya perwerdekirinê kiriye."

### Her yek ji kantonekê

Bera dibêje, bi vê dewreyê dixwazin çand û nirxên pîroz biparêzin: "Rast e, em hemû Kurd in, lê her yek ji me ji kantonekê beşdarî perwerdeyê bûye. Bi riya her yekê ji me çanda herêma me tê nasîn. Dema em dîrok û çanda xwe nas nekin, emê xwe winda bikin. Dema mirov dîrok û çanda xwe nas bike, mirov armanca xwe jî diyar dike. Dijmin ji bo ku bingehê civakê ji hev bixe, êrişên di warê şerê teybet de dide meşandin. Em jî di vê pêvajoya girîng de hewl didin bi riya têgihîştina rastiyê bibin bersiv."

### Pergala perwerdeyê girîng e

Endama Hîlala Zêrîn ya Kantona Şehba Zîlan Sîdo jî behsa pergala perwerdeyê dike, "Pergala perwerdeyê ji bo me pir girîng e, me fêrî rêxistina demê dike. Em rojane saet di 6'an de radibin, bi hev re sporê dikin paşê em dest bi perwerdeyê dikin. Em waneyên çand û exlaq, girîngiya perwerdeyê, rêbaz, rêbertî, civaka xwezayî û girîngiya perwerdeyê dibînin. Heta seat 12'an navber e. Seat 3yan waneyên xwe heta seat 6'an dewam dikin. Herwiha êvarê em kom dibin û bi hev re storanan dibêjin, pirtûkan dixwînin, li sînevîzyonên li ser çandê temaşe dikin."

Dewre wê heyvekê bidome.

***JINHA***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | Z | İ | R | Ç | ■ | B | E | L |
| 2 | T | O | ■ | E | ■ | T | E | ■ | A |
| 3 | İ | ■ | M | ■ | M | ■ | G | A | ■ |
| 4 | ■ | C | I | V | A | K | ■ | M | İ |
| 5 | S | A | R | ■ | K | E | P | E | Z |
| 6 | A | ■ | A | X | U | R | ■ | T | ■ |
| 7 | F | I | R | O | ■ | İ | S | A | L |
| 8 | İ | ■ | İ | R | O | ■ | A | ■ | E |
| 9 | R | A | ■ | T | ■ | Ê | L | I | H |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 3 | ■ | | | ■ | | | | | ■ |
| 4 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 5 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 6 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 7 | | | | ■ | | | | | |
| 8 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 9 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |

### ÇEP-RAST

1. Ew nîjada spî ya ku tê bawerkirin ji kurê Hz. Nûh Sam peyde bûye; weke kesên ku bi erebî, ibranî, asûrî û hebeşî diaxivin... Kurteya piştî zayînê
2. Nalîn... Kurtebêja otomobîlê
3. Baneşana kêfxweşiyê... Aşît, şape, berfende
4. Îşaret, şop... Peyva neyînî
5. Tevgera hewayê... Teref... Kurtebêja Ksenonê
6. Bersiva pejirandinê, erê
7. Bêyom... Stiranên li ser miriyan
8. Agir... Ji bo qewirandina heywanên mîna mirîşk û qazan... Daçekek ku wateyê xurt dike
9. Cama mîkroskopê... Sendîkaya Karkeran ya Swêdê

### JOR-JÊR

1. Rêxistina polîsan a naziyan... Cureyekî xwînê... Paytexta Sûriyê
2. Tiştê ku pê debar tê kirin
3. (Nivîsa …) ku ji hêla Med, Faris û Asûriyan ve hatiye bikaranîn... Cînava pirjimariyê ya xwerû
4. Rojek... (Rustemê …) Destaneke me... Cînava pirsê ya ku tê wateya; li kû ye?
5. Plakaya navneteweyî ya Tirkiyê... eqreba, xizim
6. Cephe, bere... Jan
7. Nexweşiyeke çerm e ku bi taybetî di gewde, çîm û rû de weke kelepotkan xwe dide nîşan... Alif, xwarina sewalan
8. Ji bo bûkê, birayê zavê... Sedemkarê tevgerê, paldêr
9. Jimar du, çar, şeş, heşt û hwd.... (Şêx Ubeydullahê …) Di sala 1880'yî de li devera Şemzîna ji bo rizgariya Kurdan serî hilda

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Biryar** | **Li ser kirina tiştekî yan awayê kirinê bijartin, ferman, yan li hevkirin. Qerar** |
| **Biryardarî** | Israr, israra di biryarê de |
| **Erk** | Tişta ku divê kesek bike. Wezîfe, peywir: Parastina welat erkê me tevan e. |
| **Erkdar** | Kesê bi karekî hatî wezîfedarkirin. Wezîfedar. |
| **Maf** | Tişta ku qanûn yan jî çanda civakekê rê didinê ku bê kirin. Heq: Azadî mafê her kesî ye. |
| **Mafdar** | Kesê ku mafê kirina tiştekî jê re heye. Xwedîheq: Ez di gotina xwe de mafdar im. |
| **Polîtîka** (Îtalî) | Diyarkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan. Siyaset |
| **Rewşenbîr** | Kesê di mijara çand û civakî de jîr, zana û têgihiştî. Ronakbîr, entelektûel |
| **Sîvîl** (Fransî) | Kesê ne leşker. Medenî |
| **Wane** | Demek ya fêrbûnê. Ders |

## Tûrikê Çîvanokan

***Di tûrikê me de îro sirûda li ser meşkê heye. Berê li gundan meşk yek ji pêdiviyên herî girîng bû. Li her malê meşkek hebû. Piştî ku mast berdidan meşkê hinek ava sar jî berdidanê û dikeyandin. Carna jinekê tenê dikeyand, carna jê du jinan dikeyand. Her jinekê bi lewlebeke meşkê digirt û dikeyandin heta rûn bi ser diket. Piştî ku rûn bi ser diket berdidan qoçxaneyekê. Rûn ser re digirtin hiltanîn û dew jî ji bo mehîrê û xwarinên din bi kar dianîn.***

### MEŞK

Bikil bikil meşka miyê
Lewlebên te ji darê biyê


Meşka malê ji çermê nêrî
Bûka malê biriye bêrî

Dewkilê daw li ser teşkê
Mastê miyê berda meşkê

Li ser newqê berda kemer
Da ber kilan meşka qemer

Mastê meyî dewê keyî
Rûn û nîvişk jê dibeyî

Dewkilê dew berda kîsik
Nîvişkê rûn xiste dîzik



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 889 15-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Kalkan: Dem dema gelan e, dema gerîla ye

Duran Kalkan: Li seranserê cîhanê wê êdî serdema gerîla dest pê bike. Wê her kes xwe li ser xeta gerîla biparêze. Ji ber ku artêş û dewletan nikarîn mirov û gelan biparêzin, têk çûn. Xwarin, vexwarin û gel şelandin. ***R-4***



# 15'Ê TEBAXÊ ÇİRAYA KURDAN PÊ KET



- Duran Kalkan: Destketiyên heyîn hemû, bi berxwedan û şerê lehengî yê 37 salan hatine afirandin û li ser van deskeftiyan dikevin sala 38'an ya 15'ê Tebaxê. R/4
- Şadiye Omer: Li hemberî planên dewleta tirkî ya dagîrker ku dixwest û heta niha dixweze gelê Kurd qir bike, Tevgera Azadiyê bi pêngava 15` Tebaxê ev plan têk bir. R/3
- Îdris Serhed: Eger pêngava 15'ê Tebaxê bi ser neketibûya, ne gelê Kurd tenê, mûmkin bû Rojhilata Navî tev bikeve aloziyeke kûr. 15'ê Tebaxê ne li Kurdistanê tenê li seranserê cîhanê guhertin çêkirin. R/5

# Li Kobanê pîrozbayiya salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê

Salvegera Pêngava 15`ê Tebaxê bi şahiyekê li bajarokê Belek yê başûrê bajarê Kobanê hat pîrozkirin.



Şahî bi durişma "Bi ruhê berxwedana gerîla em salvegera 37`an ya Pêngava 15`ê Tebaxê pîroz dikin" hat organîzekirin. Bi dehan welatiyên Kurd û Ereb di şahiyê de amade bûn.
Piştî rêzgirtinê hevserokê Meclisa PYD`ê ya Kantona Kobanê Şêx Ehmed Hemo axivî û salvegera Pêngava 15`ê Tebaxê li Rêber Abdullah Ocalan, şehîdan û girtiyên zindanan pîroz kir.
Şêx Ehmed Hemo bal kişand ser pêvajoya berî pêngava 15`ê Tebaxê ya li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê. Herwiha rewşa Kurdan ya di wê qonaxê de û wiha axivî: "Pêngava 15`ê Tebaxê pêngaveke çarenûsî bû û di demeke dîrokî de pêk hat. Dîrokê ji wê rojê dest pê kir û tîpên wê bi xwînê hatin nivîsandin. Ji ber wê divê îro em hêjayî wê berxwedanê û şehîdên wê bin."
Piştre endama Rêveberiya Kongreya Star ya Navçeya Çelebiyê Emîne Ebdurehman axivî û got, ev pêngav bi saya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ji gelê herêmê re bû sîwan û jinan hêza xwe jê girt.
Helbestvan Îsmaîl Hecî Murad jî li ser welat û têkoşîna Kurdan ya li dijî dijmin helbest xwendin.
Di dawiya şahiyê de Koma Şehîd Xabûr ya Stiranan çend stiranên xwe gotin û beşdaran govend gerand.
*ANHA*

## Li Efrîna dagîrkirî 19 kes ji aliyê çeteyên Tirkan ve hatin revandin



**Artêşa Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê 4 şêniyên gundê Celemê yê navçeya Cindirêsê ya Efrîna dagîrkirî, revandin. Herwiha navên 9 sivîlên ji gundê Qurtqulaq yê navçeya Şera ku berî çend rojan ji aliyê çeteyan ve hatibûn revandin, diyar bûn.**

Çavkaniyekî taybet ragihand ku çeteyên dewleta Tirkan ya dagîrker 10`ê Tebaxê 4 sivîl ji gundê Celemê yê navçeya Cindirêsê ya Efrîna dagîrkirî, revandine.
Li gorî çavkaniyê, kesên hatîn revandin ev in: Azad Fadil Erebo, Elî Bekir Elo, Îbrahîm Xalid Elo û Delîl.
Çavkaniyê got, çeteyan kesên revandî birine girtîgeha gundê Îska yê navçeya Şêrewa û li hemberî berdana wan ji malbatên wan fidye xwestine.
Çavkaniyê herwiha navên 9 sivîlên ji gundê Qurtqulaqa Mezin yê navçeya Şera ya Efrînê ku çeteyên Sultan berî çend rojan 15 sivîl lê revandibûn, eşkere kirin. Li gorî çavkaniyê navên wan kesan wiha ne: Mihemed Berekat (60), Îbiş Berekat (20), Luqman Hemade (20), Ehmed Ednan Mistefa (26), Ednan Mistefa (55), Ednan Berekat, Ebdîn Elî Şebab, Mihemed Şêx Ehmed û Luqman Şêx Ehmed.
Çeteyên dewleta Tirkan ya dagîrker mala Mihemed Berekat ku tevî kurê xwe Îbiş Berekat hatiye revandin, herwiha zêdetirî 20 malên din yên heman gundî roxandibûn.
Çavkaniyê diyar kir ku Mihemd Berekat pir nexweş bû, tevî vê yekê jî hat revandin.
*ANHA*

## Rêveberiya Xweser bi rûspî û serokên eşîrên bakur û rojhilatê Sûriyê re civiya

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

**Bi armanca gotûbêjkirina rewşa siyasî, aborî û xizmetgûzarî, Rêveberiya Xweser bi rûspî û serokên eşîrên bakûr û rojhilatê Sûriyê re civîneke berfireh li dar xist.**




12ê Tebaxê saet 10an, li Hola Zana ya bajarê Qamişlo, ji aliyê Rêveberiya Xweser ve civîneke berfireh hat lidarxistin. Di civînê de rûspî û serokên eşîrên bakur û rojhilatê Sûriyê amade bûn.
Civînê bi rêzgirtina li ser giyanê şehîdan dest pê kir. Piştre nûnerên Rêveberiya Xweser rewşa bakur û rojhilatê Sûriyê nirxandin. Rûspî û serokên eşîran li ser rewşa heyî û riyên çareserkirinê nêrînên xwe anîn ziman. Di dawiya civînê de nûnerên Rêveberiya Xweser nerîn hemû kom kirin û hatin guftûgokirin. Di vê guftûgoyê de sedemên pirsgirêkên heyîn dan xuyakirin. Civîn bi hêviya çareserkirina pirsgirêkan qediya.

## Rêjeya serkeftinê 66 e

**Encamên ezmûnên dewreya duduyan (tekmîlî) ya refa 12`an li herêma Cizîrê hat ragihandin. Rêjeya serkeftinê ji sedî 66 hat diyarkirin.**

Roja Pêncşemê seat 16:00'an encamên dewreya duduyan ya ezmûnên refa 12`an derketin. Li gorî agahiyên ji Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê hatîn bidestxistine, rêjeya serkeftinê gihat ji sedî 66.
28`ê Tîrmehê dewreya duduyan ta ezmûnên refa 12`an li herêma Cizîrê dest pê kir û ji bo beşa zanistî 5`ê Tebaxê, herwiha ji bo beşa wêjeyî 4`ê Tebaxê bi dawî bû.
Jimara xwendekarên tevlî dewreya duduyan bûyîn gihat 2 hezarî.
27`ê Hezîrana borî ezmûnên dawiya salê ya refa 12`an (dewreya yekê) bi dawî bû. Rêjeya serkeftina xwendekaran ji sedî 63 bû.



Sala perwerdeyê ya 2020-2021`ê, Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê biryara pêkanîna sîstema ezmûnên dawiya salê ji bo refa 12`an da.
*ANHA*

## Nûnerê Rêveberiya Xweser ev 64 roj in hatiye revandin

**Nûnerê Rêveberiya Xweser li yê Başûr Cîhad Hesen 64 roj in ji aliyê PDK`ê ve hatiye revandin. Li gorî Nûnertiya Rêveberiya Xweser ya başûrê Kurdistanê, tenduristiya Cîhad Hesen ne baş e.**



10`ê Hezîranê, çekdarên PDK`ê nûnerê Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê yê li Hewlêrê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD`ê Mistefa Xelîl Osman û Mistefa Ezîz Mistê ku ji bo pêşwazîkirina mêvanên xwe, berê xwe dabûn balafirgeha Hewlêrê, revandin.
29`ê Tîrmehê, du endamên têkiliyan yên PYD`ê, piştî 50 rojî hatin berdan. Lê nûnerê Rêveberiya Xweser Cîhad Hesen hê di destê PDKê de ye û tenduristiya wî xirab e.
Ev kiryarên PDK`ê di çarçoveya binpêkirina rêgezên diplomasiye yên navneteweyî de pêk tên, ku li gorî wan rêgezan nabe ku siyasetmedar yan diplomat bê sedem yan sûcekî diyar li dijî wan hebe, werin revandin yan destgîrkirin. Eger werin destgîrkirin jî divê aliyên ku kes girêdayî wan in, werin agahdarkirin.
Heta vê kêliyê jî rayedarên PDK`ê sedemên revandinê ji PYD`ê û Rêveberiya Xweser re diyar nekirine.
*ANHA*

## Li Girê Spî dagîrkeran 2 jin û pitikek revandin



**Çavkaniyên herêmî ji Girê Spî ya dagîrkirî ragihandin ku istixbarata dewleta Tirkan û çeteyên wê ji bajarokê Hemam El-Tirkmen yê girêdayî kantonê, 2 jin û pitikek revandine.**

Li gorî heman çavkaniyan istixbarata dewleta Tirkan û çeteyên wê bi ser bajarokê Hemam El-Tirkmen de girtine û Maya Xelef Xelîl ya ji eşîra El-Bakîrat ya Tirkmen û pitika wê ya 40 rojî revandine.
Çavkaniyan da zanîn ku jina din ya dagîrkeran revandî, navê wê Rewda Ebdulehmed e û ji eşîra El-Tobal ya Tirkmen e.
Çavkaniyan herwiha diyar kir ku her du jinan berî ku werin revandin, xwe spartibû rûspiyê eşîra El-Tobal Xelef Mihemed El-Xelef da ku wan biparêze. Tevî vê jî hêzên dagîrker ew revandin.
*ANHA*



# *Aram Tîgran…dengê aştiyê*

Digel ku mirovekî Ermenî ye bi stiranên kurdî yên resen û kevnar hat naskirin. Kesê guhdarî stiranên wî dikir nizaniya ku ne Kurd e. Ew kes hunermendê nemir Aram Tîgran e.

**Hediya HISÊN-Qamişlo**



### Jiyan û destpêka gera hunermend Aram ya hunerî

Çawa ku tê zanîn di fermana Ermenan ya sala 1915 de ku bi destê dewleta Tirkan çêbû, milyonek û nîv Ermen hatin kuştin. Bapîrê Aram di wê fermanê de tê kuşin. Bavê Aram Tîgran Sakoy Mîlîkan ji gundê xwe Amîdê yê girêdayî navçeya Sason ya Êlihê koçî navçeya Fareqînê ya Amedê dike. Axayekî Kurd li mala xwe wî vedişêre. Sala 1928an bavê Aram diya Aram ku wê jî koçî Farqînê kiribû, nas dike û hev direvînin tên bajarê Qamişlo.
Aram Tîgran sala 1934an li bajarê Qamişlo di malbateke heskera mûzîkê de ji dayîk dibe. Bavê wî ji mûzîkê pir hes dike û li bilûrê dixist. Aram jî fêrî lêxistina bilûrê dike. Dayîka wî jî bi dengê xwe yê xweş dihat naskirin. Dema Aram şeşsalî mamê wî tembûrekê diyarî wî dike. Di 15 saliya xwe de Aram dibe tembûrvanekî jîr û li dawetan de stiranan dibêje. Bavê wî piştgiriya wî dike. Jê re gotinên stiranan dinivîse û ew jî dibêje. Pişt re fêrî cumbûşê dibe.

### Huner û stiranên Aram

Lêxistina cumbûşê bala Aram dikişîne û pir jê hes dike. Dema li cumbûşê dixe mirov dizane ku ji hest û dil e. Pişt re dest bi stiranên kurdî dike. Stirana wî ya yekê ya bi kurdî dibêje ji helbestên Cegerxwîn e. Sala 1957an Aram bi Sîlva re dizewice û sê zarokên wan (Agob, Sîvan û Îcîmîk) çêdibin. Sala 1966an Aram ji Qamişlo koçî Eremenistanê dike û li paytet Êrîvanê bi cî dibe. Stiraneke wî ya binavûdeng heye ku li ser xweşikbûna Ermenistanê dibêje: "Hatim hatim Hayistan çi xweşik e Abû Viyan çi xweşike Yêrîvan"
Gelek hunermend û stiranbêjên mîna Karepêtê Xaco, Sosoka Simo û Seyda Şemdîn li Êrîvanê nas dike. Herwiha di beşa kurdî ya radyoya Êrîvanê de bi wan re kar dike. Helbestên gelek helbestvanên Kurd yên mîna Feqiyê Teyran, Seydayê Tîrêj û Seydayê Keleş dibêje. Yek ji stiranên wî yên Kurdî ya binavûdeng ku sala 1965an dibêje, ya bi navê `Şev Çû` ye. Çend stiranên wî yên din yên binavûdeng ku bi kurdî gotine ev in: `Ay dîlberê, Serok Apo, Zimanê Kurdî, Bilbil, Newroz e Newroz e û hwd… 11 elbomên wî ku ji 120 stiranan pêk tên hene. Digel stiranên Ermenî 300 stiranên wî hene.

### Çûna Ewropa

Hunermend Aram sala 1985an vê carê ji Eemenistanê koçî Ewropa dike. Li Almanya, Belçîka, Frnsa, Siwêd û Îtalya tevlî gelek çalakiyê hunerî û çandî yên ji aliyê civata Kurd û Ermenî ve tên amadekirin dibe. Bi hezaran xelk beşdarî çalakiyên Aram tevlî wan dibe, dibin.
Piştî gera xwe ya hunerî vê carê jî koçî paytexta Yewnanistan Atîne dike. Ji Atîna diçe Batmanê û tevlî Newroza 2008an dibe. Herwiha sala 2009an tevlî mihrîcana Amedê ya çandî dibe. Di mihrîcanê de tê xelatkirin. Piştî mihrîcanê ji bo serdana dapîr û bapîrên xwe diçe Sason, Farqîn û Amîdê.

### Bi dengê xwe dilê her kesî dike waletê xwe

8ê Tebaxa 2009an piştî ku ji Amedê vedigere kirîza dil pê re çêdibe û jiyana xwe ji dest dide. Bi hiceta ku ne Tirk e, dewleta Tirkan ya faşîst nehêle li cihê dapîr û bapîrên xwe were veşartin. Bi merasimeke girsayî û bi tevlîbûna malbatê û bi dehan kesên binavûdeng ji Kurd û Ermeniyan li paytexta Belçîka Brûkselê tê veşartin.
Rêber Apo dibêje, li Serê Kaniyê ez çûbûm serdana melbatekê. Dengekî xweş yê zelal hat guhê min. Lê min nizanî ka dengê kê ye. Pişt re min zanî ku ev dengê hunermendê mezin Aram Tîgran e. Ew deng ket dilê min û min got ev deng nabe ku bimire.
Aram Tîgran bi dengê xwe yê xweş cihê xwe di dilê her kesî de çêkir.

## Amed xwe ji Mihrîcana Feqiyê Teyran re amade dike

**Navenda Hûnerê ya Mordem Bariş Işik ku di xebata Mihrîcana Feqiyê Teyran ya Çand, Huner û Xwezayê ya Navneteweyî de ciyê xwe digire, diyar kir ku wê sazî û dezgehên navneteweyî jî beşdarî bernameya xwe ya nîqaşên Îlonê bikin û banga tevlîbûna mihrîcanê li welatiyan kir.**

Bi tevlîbûna Odeya Bazirganî û Senayiyê ya Amedê (DTO) û gelek saziyên sivîl yên civakî, Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçberiyê, Wêphotos, Navenda Hunerê ya Mordem, Atolye A4, Wêjegeh Amed û Kolektîfa Hunerê ya Merkezkaçê li avayiya Navenda Hunerê ya Mordem ya li navçeya Peyas ya Amedê bi daxuyaniyeke çapemeniyê 3'yê Hezîranê ragihandibûn ku wê Nîsana 2022'yan li Amedê Mohrîcana Feqiyê Teyran ya Çand, Huner û Xwezayê ya Navneteweyî li dar bixin. Rêveberê Navenda Hûnerê ya Mordem Bariş Işik, derbarê xebata mihrîcanê de agahî dan.

Işik, diyar kir ku wek Hunera Mordem, Atolye A4, Wephotos, Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçberiyê, Kolektîfa Hunerê ya Merkezkaçê û Wêjegeh Amed biryar dan ku mihrîcanekê bi navê Feqiyê Teyran li dar bixin.

Işik, da zanîn ku bi 6 koman re li ser projeyekê hatin gel hev û wiha axivî: "Naveroka xebata me jî Feqiyê Teyran bû. Feqiye Teyran helbestvanekî me yê mezin e. Me got em li ser wî lêkolîn bikin û bixebitin. Bi vî awayî ev mihrîcan derket holê. Eger me 6 koman karî bên gel hev, wê demê emê bikarin komên derveyî xwe jî beşdarê vê xebatê bikin ku mihrîcan xurttir bibe. Ji ber wê em li sazî û dezgehên sivîl yên Amedê geriyan. Ji bo destpêkê em gihîştin armanca xwe. Gelek ji koman hatin danasîna mihrîcanê."

### 'Ji zarokan heta pîran li benda herkesî ne'

Işik, diyar kir ku daxwaziya wan ew e ku tevayiya saziyan bi karê xwe beşdarî mihrîcanê bibin û wiha got: "Emê bi saziyên ku em pê re axivîn re yan dawiya meha Tebaxê yan jî serê meha Îlonê civînekê li dar bixin. Wê di civînê de her kes karê ku bikare bike bibêje. Destpêkê emê karê saziyên ku ji Amedê beşdar dibin diyar bikin, pişt re jî yên navneteweyî. Mohrîcan wê li ser çand, huner û xwezayê be. Jixwe di Mohrîcana Feqiyê Teyran de jî ev heye. Çend cihên ku diyar in hene, lê em hê li cih digerin. Mînak wê di mihrîcanê de cihê kampê jî hebe. Wê kon werin vedan, performans, atolye û perwerde çêbin. Kesên ku em li benda tevlîbûna wan in jî, ji 7 salî heta 70 salî ne."




### Xebata mihrîcanê didome

Işik, da zanîn ku xebata wan ya ji bo mihrîcanê dewam dike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Wê Wêjegeha Amedê, di mihrîcanê de li ser Feqiyê Teyran panel û semîneran li dar bixe û broşûrên li ser Feqiyê Teyran amade bike. Di heman demê de, wê bi Tora Ziman û Çanda Kurdî û MED-DER'ê re di nava hevkariyê de bin. Wê Atolye A4 û Kolektîfa Hunerê ya Merkezkaçê pêşangehekê vekin. Dibe ku pêşangeh li bajêr li gelek cihan were vekirin. Wê tevayiya cureyên hûnerên dîtbarî û wêne di pêşangehê de hebin. Wê Atolya A4 û Wephotos belgefîlmekê li ser Feqiyê Teyran çêkin. Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçberiyê jî wê li ser Feqiyê Teyran çîrokan ji zarokan re bêje. Em wek Mordem Sanat felsefeya Feqiyê Teyran wek şano bi mûzîkalê pêşkeş bikin. Em bi Tora Ziman û Çanda Kurdî re jî axivîn. Dibe ku sala 2022'yan weke sala Feqiyê Teyran were ragihandin. Ma Muzîkê jî got em dikarin bi koma zarokan konserekê li dar bixin. Dibe ku Şanoya Bajêr ya Amedê jî bi lîstikeke gelêrî beşdarî mihrîcanê bibe."

### Banga xwedîderketinê

Bariş Işik, da xuyakirin ku têkiliya wan bi hin komên derveyî welat re jî heye û wiha got: "Kesên ku dixwazin di vê mihrîcanê de cih bigirin, yên ji nava Amedê yên derveyî wê bila xwe bigihînin me ku em ji wan re bibin alîkar û di mihrîcanê de cih bigirin. Li aliyê din em dixwazin ku ev mihrîcan yan salekê yan du salan carekê were lidarxistin û bibe kevnepşopiyek. Ji ber wê daxwaziya me ew e ku gel jî lê xwedîderkeve. Banga me ya herî mezin ev e."

*Mezopotemya*



### Civakê nekin neyarê hev bavê Min!

**Sîpan Şînda**

Ji roja mirovayiyê dest pê kirî û hetanî niha pirr hizirîn, pirr bawerî, pirr Xwedayetî, pirr serîtî û hwd. her û her di nava civakan de derketiye. Heta niha jî ev yek heye û wê ji niha û pêve jî hebe. Ev tiştekî gelek asayî ye û divê mirov ji vê yekê re jî rêzê bigire. Lewra civak ne tişteke mezbît e ku weke xwe bimîne. Bi taybetî di warê hizrî û mejî de civak her tim livek e ti kes jî nikare pêşiya vê yekê bigire. Berûvajî mirov hewl bidin pêşî lê bigirin, divê mirov hevdu sîx bide û livekiyê di nava civakê de gur û geş bike. Nexwe civak wê pêş ve neçe, hizrên nû wê dernekevin pêş û civak wê tiral bibe. Civakeke tiral jî her tim berminetê xelkê ye û çavê wê li ber destê xelkê ye. Di vê derê de jî bar dikeve ser milê rewşenbîran ku pêşengiya civakê bikin û fikrên nû pêşkêşî civakê bikin. Lê belê divê rewşenbîr jî bizane ka ew çi dike û çi dibêje.

Bêguman divê ti car û ti heyaman rewşenbîr neyên qeydûbendkirin. Qeydûbendkirina rewşenbîran, yan jî hewldana vê, weke mirov civakekê bêxe şkefteke tarî û bêderî û ne ti ronî û ne jî ti alav di destê wî de hebe ji xwe re riyekê veke da ku ji şkeftê derkeve. Qeydûbendkirina rewşenbîran weke çikandina avê ji ser dehlekê ye; pêşî pelên wê zer dibin û paşê jî hişk dibe. Ji ber wê divê rewşenbîr bi mejjiyê xwe, bi dilê xwe, bi giyanê xwe azad be. Lêbelê divê rewşenbîr jî bizane peywira xwe û li wê gorê civakê ronî bike, ne civakê têk bide.


Rewşenbîrên Kurd îro ji desthilatdarên Kurd pirtir civaka Kurd rexne dikin û tu dibêjî qey tevayiya xirabiyê ji nava civakê derdikevin. Baş e, emê kêmayiyên civakê bêjin, lêbelê divê em civakê ji hev nepijiqînin û di nava civatan de, baweriyan de, hizran de neyartiyê çênekin. Divê em wisa nekin ku ew bibin reşê hev. Hinek rastiyên civakê hene divê rewşenbîr jî qebûl bikin. Civaka Kurd civakeke bawermend e. Çi Misilman, çi Êzîdî, çi Cihû, çi Mesîhî, yan jî tişteke din be ferq nake, heqê ti kesî nîne êrişî baweriyên civakê bike. Êzdayetî baweriya Kurdan ya kevin e, lêbelê îro pirrê civaka Kurd ji Misilmanetiyê bawer dike. Divê ti kes ranebe neavêje Êzdayetiyê û Êzîdiyan bi ti tiştan tewanbar neke. Herwiha divê ti bawermend jî neavêjin ola Islamê û Kurdên Misilman rencîde neke. Yan jî di nava mezheban de divê ev yek neyê kirin. Gelek caran em dibihîzin ku gelek kes di vî warî de êrişî pîroziyên civakê dikin. Yên vê yekê dikin jî pitirê xwe kesên cahil in û di vî warî de bar dikeve ser milê rewşenbîran ku civakê ronî û hişyar bikin.

Bavê min, jixwe neyarê me her roj bi hêcetên cuda êrişî me dikin û dixwazin civaka me ya heyî jî tert û belav bikin, ji hev bipijiqînin û pirtir bikin neyarê hev. Jixwe ol ji bo wan alavê herî hêsan e ku li himberî civaka me bi kar tînin. Her roj me bi van hêcetan berdidin hev û taqên di navbera baweriyên cuda de stûrtir dikin. Bi kurtayî, divê em hemû bi hev re di vî warî de hişyartir bin û ji bo civakê li hev şîrîntir bikin û taqên bi sedê salan e ji aliyê xêrnexwazên me ve di nava baweriyên cuda de hatîn danîn hilweşînin.

# Civînên bi gel re kilîtên çareseriyê ne

**Rûspiyên êl û eşîrên bakur û rojhilatê Sûriyê girîngiya civînên bi gel re nirxandin û bang li rêxistinên navneteweyî û welatên Ereban kirin ku piştgiriya Rêveberiya Xweser bikin.**

**Mihemed Mehmûd/Qamişlo**








Ji ber dewama kirîza Sûriyê, bi taybetî êriş û ambargoya li ser bakur û rojhilatê Sûriyê, gelek pirsgirêkên aborî, siyasî û xizmetgûzarî derketin. Ji bo guhdarîkirina pirsgirêk û nerînên gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, Rêveberya Xweser bi rûspî û serokên eşîran re civiya. Civîn 12'ê Tebaxê seat 10'an li Hola Zana ya bajarê Qamişlo pêk hat. Di civînê de ji aliyê nûnerên rêveberiyê ve rewşa bakur û rojhilatê Sûriyê bi awayekî berfireh hat nirxandin. Rûspî û serokên eşîran pirsgirêkên welatiyan dan xuyakirin û riyên çareseriyê anîn ziman. Ji bo girtina agahiyên zêdetir rojnameya me hin hevdîtin bi rûspiyan re pêk anîn.

### Hewldanên çareseriyê

Ji rûsipiyên êla Şerabiyan û endamê ofîsa têkiliyên hozên Ereb yên herêma Cezîrê Mihemed Hemdûn, ji me re axivî û got, em hozek ji vê civakê ne. Rêveberiya Xweser jî ji civakê ye, nûnertiya civakê dike û êşa civakê derman dike. Mihemed herwiha li ser girîngiya civînên Rêveberiya Xweser yên bi gel re ev nirxandin kir: “Dema Rêveberî bi welatiyan re hevdîtinan dike û li êşên wan guhdarî dike, di navbera civak û rêveberiyê de girêdaneke bihêz çêdike. Tevî ku hin pirsgirêk ji ber derfetên kêm yên rêveberiyê nayên çareserkirin, projeya wê ya ji bo aştiya deverê û pêkanîna demokrasiyê, projeya herî guncaw e.”

Di dewama axaftina xwe de Hemdûn bal kişand ser metirsiyên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û wiha axivî: “Pêwîst e em hemû bi hev re parastina xaka xwe bikin û li derdora hêzên xwe yên leşkerî kom bibin. Eger agir were, wê her kesî bi xwe re bişewitîne û nabêje ev Kurd e yan Ereb e yan jî Suryan e. Rêveberiya Xweser vîn û hebûna gel e.”

Mihemed Hemdûn di dawiya nirxandina xwe de bang li tevayiya rêxistinên navneteweyî û welatên Ereban, bi taybetî Misirê kir ku alîkariya Rêveberiya Xweser bikin û bi awayekî fermî têkiliyan pê re daynin. Herwiha bang li hozên bakur û rojhilatê Sûriyê kir ku li dora Rêveberiya xwe bibin xelek û ji planên xerab biparêzin.

### Civak stûna rêveberiyê ye

Li ser heman mijarê ji rûspiyên bajarê Tirbespiyê û dadgerê dadgeha gel ya bajêr Hecî Ebdê wiha axivî: “Pir girîng e ku Rêveberiya Xweser bi her beşa civakê re civînan çêke. Lewra bi van civînan gel nerînên xwe diyar dike û bi hêviya çareserya pirsgirêkan hin tiştan rexne dike. Civînên bi gel re herwiha di navbera wan û rêvberiyê de baweriyê bihêztir dike.”

Hecî Ebdî di dawiya axaftina xwe de, ji Rêveberiya Xweser xwest ku civînên gel bidomîne û civakê li derdora xwe kom bike. Herwiha da zanîn ku Rêveberiya Xweser hêza xwe ji gel digire.

# Sozdar Ehmed: Av nagihe bajarê Hesekê

**Hevseroka Rêveberiya Avê ya Hesekê Sozdar Ehmed got, li stasyona Elokê dizî çêdibe û av nagih bajarê Hesekê. Herwiha bang li rêxistinên navneteweyî kir ku stasyonê ji nakokiyên siyasî û leşkerî dûr bixin.**



Leşkerên dewleta tirî ya dagîrker û çeteyên wê nêzî du mehan e bi behaneyên derew ava stasyona Elokê li ser Hesekê û gundewarên wê qut kirine.

Stasyona Elokê ji bo Hesekê, Til Temir û hêrmên başûrê Hesekê; Hol, Erîşa, Şedadê, Mergede û kampên li herêmê; kampa Erîşa, Hol, Wasûkanî û Serê Kaniyê xwedî girîngiyeke stratejîk e. Li wan herêman ser milyonekî re welatî hene.

Girêdayî mijarê Hevseroka Rêveberiya Avê ya Hesekê Sozdar Ehmed got, stasyona Elokê ser 50 rojî re bê navber sekiniye û careke din jinûve hat xebitandin lê bi enerjiyeke pir kêm bû.

Sozdar Ehmed diyar kir ku ji 34 bîran heta niha 6 bîr dixebtin û ji 8 pompeyan yek dixebite. Herwiha got, 14 bîr nedixebitîn, dema werşeyên sererastkirinê derbasî stasyonê bûn ev bîr hatin sererastkirin û niha di xizmetê de ne.

Sozdar Ehmed diyar kir ku dagîrkeriya tirkî nehêle ji bilî 6 bîran û pompeyekê bixebitin.

### LI STASYONÊ DIZÎ ÇÊDIBE’

Sozdar Ehmed da zanîn ku çeteyên dagîrkeriya tirkî gelek alavên stasyona Elokê dizîne, di encamê de stasyon bi demeke dirêj ji xizmetê derket.

Sozdar Ehmed li ser gotinên ku stasyon dixebite û av digihîje bajarê Hesekê wiha axivî: “Ev gotegot dûrî rastiyê ne. Berî hefteyekê dema av gihîştiye bajêr me yekser da taxên Neşwa.”



Rêveberiya Avê ya kantona Hesekê bi Rûsya “Garantor” re rewşa avê li stasyona Hime û Til Temir dişopîne. Têkildarî vê rewşê Sozdar Ehmed ev agahî dan: “Garantorê rûsî piştrast kir ku gotegotên tên kirin tev dûrî rastiyê ne û rêveberiya avê bi duristî dixebite û dema av peyda bibe hewl dide avê bigihîne bajêr.”

Sozdar Ehmed bal kişand ser xwestekên Rêveberiya Xweser ya xebitandina 5 pompe û 20 bîran da ku avê bi awayekî baş bigihîne bajêr.

Têkildarî kiryarên dewleta tikrî ya dagîrker Sozdar Ehmed da xuyakirin ku dagîrkeriya tirkî miqdareke mezin ji kehrebeya bendava Tişrînê ku li ser ava çemê Firatê dixebite dixwaze û got, ji ber kêmbûna rêjeya ava Firatê stasyon nikare kehrebeyê bi miqdareke mezin bide. Ji ber wê kehrebeuê dike behane û avê qut dike.

Li ser projeya kişandina avê ji çemê Firatê ber bi Hesekê ve Sozdar Ehmed wiha axivî: “Proje ew e ku jinûve stasyona heyî were sererastkirin. Xebata projeyê bi dawî bû, lê ji demekê ve ye em dixebitin ku karê li stasyonan bûyî were testkirin. Lê ji ber kêmbûna ava çemê Firatê ku dewleta Tirkan kêm kiriye û astengiyên li ser xeta kişandina avê, av nagihîje bajêr.”

Hevseroka Rêveberiya Avê ya Hesekê Sozdar Ehmed di dawiyê de bang li rêxistinên mirovî û navneteweyî kir ku stasyona Elokê dûrî nakokiyên xwe yên leşkerî û siyasî bixin û got stasyon avauiyeke zindî ye, rewş çi dibe bila bibe divê ev stasyon werin xebitandin.”

***ANHA***

# Gundê Girê Dêra pêdiviya sebzeyên Girkê Legê bi cih tîne

**Gundê Girê Dêra pêwîstiya navçeya Girkê Legê yê girêdayî kantona Qamişlo ji her cureyê sebzeyan bi cih tîne. Başûbûna cureyên sebzeyan yên Girê Dêra di nava herêmê de binavûdeng e.**



Gundê Girê Dêra girêdayî herêma Aliyan ya 10 km li bakur rojavayê bajarê Girkê Legê ye û ji gundên herî kevin yên herêmê ye. Bi hebûna 12 kaniyên avê, gundê Girê Dêra bi dewlemendiya xwe dihat naskirin. Lê bi demê re û ji ber kolana bîran û qutkirina avê ji aliyê dewleta tirkî ve, kaniyên avê yên li gund miçiqîn.

Herwiha dewlemendiya gund di aliyê avê û axa baş de, bû sedem ku şêniyên gund di çandiniyê û xwedîkirina sewalan de, bixebitin. Di heman demê de, çandiya sebzeyan bi tevayiya cureyên wê hişt ku gund binavûdeng bibe. Ew sebze pêwîstiya navçeya Girkê Legê ya kantona Qamişlo pêk tîne.

Di vê derbarê de Mihemed Zekî Cebar ku bexçeyê wî bi firehiya 17 doniman li gund heye wiha axivî: “Bi girtina sînor re û ambargoya li ser bakur û Rojhilatê Sûriyê, berhemên Girê Dêra ji sebzeyan, barê welatiyên di aliyê peydakirina sebzeyan de sivik kir bê ku hewcedarî bi derve hebê.”

Mihemed Zekî Cebar axaftina xwe wiha domand: “Berhemên gund ji sebzeyan têra şêniyên wê dike û tişta ku zêde dimîne dibin sûka Girkê Legê. Ji ber wê pereyên wê dibin çavkaniyeke madî ji şêniyên wê re ku bi bihayekî erzan li gorî rewşa jiyanî ya welatiyan tên firotin.”


Berhemên gund her sal cuda ne. Ew jî li karê cotkar, derman, semad û rakirina şînatiya bi zerer, vedigere. Herwiha rêjeya barîna baranê jî roleke sereke di başbûna berhemê wê de, dilîze.

Mihemed Zekî Cebar diyar kir ku gund veguherî nimûneya xwexwedîkirinê. Herwiha bang li tevayiya welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê kir ku çandiniya xwe pêş bixin da ku xwexwedîkirinê ji herêmê re, pêk bînin.

***ANHA***

# Li Tebqa firûna alî jinûve tê avakirin

**Ji bo çareserkirina pirsgirêka nan, Komîteya Aborî ya Tebqa dest bi xebata jinûveavakirina firûna alî kir.**



Firûna alî ku nan li tevayiya Tebqa belav dikir, ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatibû hilweşandin.

Firûna alî ya Tebqa ku di nava bêjêr de ye 24 saetan dixebitî û bi vê yekê belavkirina nan bi awayekî rêxistinkirî pêk dihat û nanê wê baş bû.

Bi pêngava Xezeba Firatê re li bajarê Tebqa çeteyan alavên firûnê birin herêmên di binê dagîrkeriya wan de li Reqa û Dêrazorê û dema QSD`ê nêzî bajarê Tebqa bû, çeteyan firûn bi temamî teqand û hilweşandin.

Di demên dawî de li bajarê Tebqa pirsgirêka nan derketibû, nexasim bi hatina koçberan re, nan têra herêma Tebqa nedikir.

Ji ber wê Komîteya Aborî ya Tebqa jinûve dest bi avakirina firûna alî kir, da ku rewşa nan baş bibe û pêdiviyên welatiyan bi tevayî ji aliyê nan ve, bîne cih.

Piştî nîqaşkirina projeyê, komîteyê berî çend rojan dest bi xebat jinûveavakirinê kir. Li gorî Cîgirê Komîteya Aborî Wayil El-Denden tê payîn di nava 100 rojî de avakirina firûnê bidawî bibe.

Wayil El-Denden piştrast kir ku firûna alî ya nû wê saetê 375 torbe nan derxe û bi vê yekê wê nan li tevayiya herêmê peyda bibe.

***ANHA***



# `Guleya 15`ê Tebaxê gelê Kurd şiyar kir`

**Şadiya Omer diyar kir ku, ji bo gelê Kurd doza mafê xwe neke, dijmin ew xistibû nava xewa mirinê. Lê plana wan pêk nehat, guleya 15`ê Tebaxê gel şiyar kir.**

**Dilîn EHMED-Qamişlo**

Ji bo azadiya gelê Kurd û rizgarkirina Kurdistanê ji bin dagîrkirinê, li navçeya Dihê û Şemzîna 15ê Tebaxa sala 1984`an Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) bi fermandariya Mahsum, Korkmaz gaveke dîrokî hat avêtin. Şerê ku ev 37 sal in dewam dike, dest pê kir. Gelê Kurd li seranserê cîhanê vê rojê bi çalakiyên cida (meş, semîner, şahî) bîr tîne.

### Roja vejîn û berxwedanê

Endama Meclisa Jinan ya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Şadiya Omer, li ser mijarê ji me re axivî û got, ev roj li tevayiya gelê azadîxwaz bi taybetî gelê Kurd pîroz be. Şadiya Omer diyar kir ku, Tevgera Azadiyê bi vê pêngava 15`ê Tebxê peyama dema hesabxwestinê ji dewleta tirkî da. Şadiya axaftina xwe wiha domand: “Roja vejînê 37 sal ji berxwedan û têkoşînê li pey xwe hiştin û derbasî sala 38`an dibe. Li hemberî planên dewleta tirkî ya dagîrker ku dixwest û heta niha dixweze gelê Kurd qir bike, Tevgera Azadiyê bi berxwedana 15` Tebaxê ev plan têk bir. Heta roja îro jî, ji bo azadiya gelê Kurd û rizgarkirina Rêbertiyê, ev tevger bi têkoşîneke bêhempa li hemberî dijmin li ber xwe dide. Ji ber wê em dibêjin ev roj cejna vejînê ye.”

Şadiya Omer got, pêngava 15`ê Tebaxê, dîroka gelê Kurd jinûve nivîsand. Di encama vê pêngavê de, jihevketina gelê Kurd hat rawestandin û hat guhertin. Herwiha di demeke kin de, Tevgera Azadiyê bi têkoşîna xwe, pirsgirêka gel xist rojeva dewletên serdest û tevayiya cîhanê.

### `Berxwedana 19`ê Tîrmehê berdewama têkoşîna 15`ê Tebaxê ye`

Li ser şoreşa Rojava û berxwedana ku niha tê kirin Şadiya Omer wiha dirêjî da gotinên xwe: “Ji bo gelê Kurd doza mafê xwe neke, dijmin bi şerê xwe yê taybet, gel dixe xeweke giran. Lê ji ber ku armanca kar û xebata Tevgera Azadiyê xilaskirina gelê Kurd ji bindestiyê ye, bi guleya xwe ya yekê gel hişyar kir. Li bakurê Kurdistanê berxwedana 15`ê Tebaxê, gel hişyar kir, bû sedem li Rojava jî şoreşa 19`ê Tîrmehê pêk were. Gelê bakur û rojhilatê Sûrî, moralê têkoşîna şoreşa Rojava, ji gulaye 15`ê Tebaxê girtiye. Tevî hewldanên dewletên serdest di serî de jî dewleta tirkî, ku dixwazin berxwedana vê şoreşê bişkînin, gel li ber xwe dide û soza azadiya welat daye.”

Li ser êrişên dewleta tirkî û hevkarên wê Şadiya got, ne li Bakur û Rojava tenê, li her çar parçeyên Kurdistanê ji bo tinekirina gelê Kurd, dijmin bi şev û roj êriş dike. Şadiya Omer axaftina xwe wiha domand: “Ji bo gelê Kurd bigihîje mafê xwe, li seranserê cîhanê li ber xwe dide. Lê pirs ev e. Çima cîhan çavê xwe ji vê neheqiya ku li me dibe digire? Çima dewleta tirkî li çiyayên azad çekên qedexekirî bi kar tîne? Gelo ew mafî wî ye lê ne mafê gelê Kurd e ku hebûna xwe biparêze. Gelê Kurd jî xwedîdîrok e, mafê wan jî heye ku li ser erdê xwe bi ziman û çanda xwe bijîn. Ji bo parastina mafê gelê Kurd û tevayiya gelê bindest, ev çend meh in Gerîlayên Azadiyê li hemberî tang û topên dewleta tirkî li ber xwe didin, li zindanên Tirkiyê greva birçîbûnê dewam dike. Ti kes nikare vê rastiyê inkar bike ku, armanca fikir û felsefeya vê tevgerê azadiya gelan ji dewletên serdest e.”



### `Dem dema pêkanîna dozê ye`

Endama Meclisa Jinan ya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Şadiya Omer axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji bo careke din dîroka me ji aliyê serdestan ve neyê wendakirin, zimanê me, çanda me neyê paşguhkirin, divê em li dîrokê vegerin û nekevin heman şaşîtiyê. Niha ya herî girîng û pêwîst ew e ku, miletê me bi şerê dijmin yê taybet neyê xapandin. Guherînên bi şoreşê re çêbûyîn, destkeftiyên bi qehremaniya şehîdan pêk hatîn, ji dijmin re nehêlin. Dem hatiye ku em jî weke gelên dinyayê azad bijîn. Dem hatiye ku em bi têkoşîna xwe Rêbertiyê rizgar bikin. Dem hatiye ku em planên dijmin bi berxwedana xwe têk bibin. Niha dem dema pêkanîna dozê ye.”

# Keçên ciwan yên Helebce di kareteyê de serkeftî ne

**Hunera xweparastinê karete, di nava keçên Helebce de pêş ketiye û gelek keçên ciwan fêrî kareteyê dibin.**



Hunera xweparastinê qerete yek ji şaxên hunerê ye di van salên dawî de jinên ciwan berê xwe dayê ye. Gelek dayik û bav zarokên xwe dibin daku fêrî hunera qereteyê bibin. Tîma werzîşê ya Helepçe bi navê Tîma xwe pileya yekemtî bi dest xistiye. Di pêşbazîyên navdewletî de Kupa Master ya bajarê Tahran ya di navbera 13 welatan de pileya sêyemtî bi destxistin. Niha ji 5 leyîstokvanên jinên ciwan xwe ji bo antrenortiyê amade dikin. Antrenorê werzîşa Helepçe yê beşa qeretê Eyub Ehmed diyar kir ku beşê qeretê li Helepçe di sala 2016’an de hatiye avakirin. Eyub da zanîn ku di destpêkê de leyîstokvanên wê kêm bûn û herî kêm ji keçên ciwan bejdar dibûn, lê belê niha 109 xwendevan ên temenê wan di navbera 12-30 salî de hene. Eyub bilêv kir ku heta niha ev tîme bejdarî pêşbaziyên Îraqê û Navdewletî bûne û encamên baş jî bi dest xistine.

### “Lîstokvanên me yên serkeftî hene”

Lîstokvana tîma werzîşê ya Helepçe Ayinde Mehemed a sê salane di hunera xweparastinê de antrenortiyê dike got: “Asta lîstokvanan gelek başe û roj bi roj hîn zêdetir pêş dikevin. Zêdeyî 70 kesên ku dixwazin fêr bibin hene ku bejdarî pêşbaziyên navxweyî û navdewletî bûne û pileyên gelek baş me bi dest xistiye.”

### “Dixwazim bibim lîstokvaneke bijare”

Selar Zeynedîn jî di beşa qereta Helepçe de xwedî kemera qehweyi ye xwesteka xwe ya ji bo qereteyê wiha anî ziman: “Ev nêzî pênc salane ez qeretê dilîzim û rojane xwe ji bo antrenortiyê amade dikim. Ez gelek kêfxweş dibim dema keçên ciwan berê xwe didin cihek wisan. Ez dixwazim bibim lîstokvanek bijartî û encamên baş bi dest bixim.”

### “Karete ne ji bo kuran tenê ye, keç jî dikarin tê de pêş bikevin”

Derya Sîrwan a ku nu fêrî qereteyê dibe û nêzî salekê ye bejdar bûye jî dibêje: “Lîstoka qeretê ne tenê ji bo kurune, ez daxwaz ji dayik û bavan dikim ku keçên xwe jî bişînin qeretê ji ber ev lîstok lîstokek bi tendiruste. Ez hewil didin di demê xwe de amade bibin û antramanên xwe di demê xwe de bikim. Ez ê berderwam bikim heta ku xwe digihînim kemera reş.”

***JÎNHA***



## Her zarok dişibe navê xwe

**Zehra TUNÇ**

Li binê konê reş yê çarstûnî yê li zozanê Kêla Memê ku çaydana reş li ser terafa li pêşiya kuçikê hêdî hêdî dikele û li pişt çaydanê jî agir ronêyê dide her çar kenarên kon, destana Cembeliyê kurê Mîrê Hekarî bi dengê denbêj Ehmedê Hemo gelek xweş li hev tê û guhdaran bi xwe re dibe li mêrgên zozanê Fereşînê digerîne û paşê careke din bi dengê dagirtina çayê re wan li binû kon vedigerîne. Piraniya guhdaran ji paleyiyê tên û hema piştî xwarina şîvê berê xwe didin dîwana Ehmed ya bitam. Li ber dengê stiranan û pişt re jî çaya li ser terafê bi bîna fereh dema xwe girtî westana xwe ya nava rojê ji ser xwe davêjin.

Her ku Ehmed bi gotina hey hey hêêê weke ku navber bide hêdî hêdî dengê xwe kêm dike pey re nefesekê digire û bi rêzikên li pey wê tên dewam dike. Ew destan bi qasî pirtûkekê hemûyê ji ber dizane, hinekê bi stiranî û di navberan de jî dengê xwe bi wezin kêm dike û hinekê bi awayê çîrokî dibêje. Careke din piştî nefesekê dengê xwe bilind dike û bi stiranî dewam dike…

Ehmed ji nava stiranên dibêje herî zêde ji destana Cembelî hes dike û navê qeheremanê wê Cembeliyê kurê Mîrê Hekarî li neviyê xwe dike. Neviyê Ehmed Cembeliyê piçûk li ber dengbêjiya kalikê xwe mezin dibe. Ew delaliyê li ber dilê kalikê xwe ye û bi baldarî li ber destê wî perwerde dibe. Bi şevan di dema gotina stiranan de li kêleka kalikê xwe rûdine û li derdorê dinêre. Êaşê jî hêdî hêdî sist dibe û li ber dengê stiranan dikeve xewê û serê wî hêdî dikeve ser çoka kalikê wî. Ew xewnan dibîne hê jî kalikê wî dewam dike. Di navberê de jî destê xwe bi ser serê wî de dibe û bi wezna stiranê re dibe yek. Heta bi dawî neke nasekine û mêvanan rênake.

Cembelî her serê sibê bi awayekî bixwebawer diket nava zarokan. Di lîstokan de xuyayî û serkêş bû. Timî zarokan jê dipirsî û difikirîn ku ew ya rast dizane. Bi wê re hê pirtir ji xwe bawer dikir û dema zarokan bi ya wî nekir li wan dixist. Qîrînî bi ser wan diket. Dayîk û bavê wan bi hawara wan ve dihatin.

Weke ku kalikê wî dizanî di dema pêş de wê bibe qehremanê destaneke din ya li Zagrosan dewam dike. Pirî caran bi baldarî û heskirin lê dinêrî. Keserekê kûr dikişand û di ber xwe de digot, ev lawik ji me re namîne, temenkurt e… Weke gotina her zarok dişibe navê xwe û bi girîngiya ku derdor didin wan û navê wan mezin dibe, Cembelî jî bi heman şêweyî bû û weke ku ew gotin tam jî li gorî tevgerên wî bû. Cembelî di temenekî piçûk de tevlî nava refên Partiya Karkerên Kurdistanê PKK’ê dibe û li herêma Zagrosan gerîlatiyê dike. Her çendî piçûk e lê nahêle hevalên wî bi çavê zarokan lê binêrin. Bi bawerî û heskirina kalikê wî dayiyê tevlî nava jiyanê û kar dibe. Di demeke kin de dibe heskiriyê ber dilê hevalên xwe. Di temenekî kin de jiyaneke weke destaneke herikbar li pey xwe hêla ku bi vegotinê dawî nabe, ji nava refên hevalên xwe koç kir û bi bêdawiya fezayê re bû yek…

# Kalkan: Dem dema gelan e, dema gerîla ye

Duran Kalkan: Li seranserê cîhanê wê êdî serdema gerîla dest pê bike. Wê her kes xwe li ser xeta gerîla biparêze. Ji ber ku artêş û dewletan nikarîn mirov û gelan biparêzin, têk çûn. Xwarin, vexwarin û gel şelandin.



Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Duran Kalkan bi pêmana salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê ji malpera PKK'ê re nivîsek nivîsî. Di despêka nivîsa xwe de Cejna Vejîna Kurdan ya 15'ê Tebaxê li Rêber Apo û tevayiya hevriyên xwe pîroz kir û got, ji bo sala 38'an ya 15'ê Tebaxê hêviyên xwe yên serketinê par ve dikim. Di şexsê fermandarê me yê nemir hevrê Egîd de, şehîdên me hemûyan bi hurmet û minet bîr tînim. Her kesê li ser bingehê pêngava 'Dem Dema Azadiyê Ye' li dijî êrişên dijmin, bi rengekî bêeman li ber xwe dide, silav dikim.

### Berdêla her şerî û her serketinê heye

Duran Kalkan axaftina xwe wiha domand: "Dem dema gelan e, dema gerîla ye. Dema artêşên klasîk, dema hêzên ku xizmetê ji mêtîngerî û zorê re dikin derbas bûye."

Kalkan da xuyakirin ku, ti serkeftinên bêberdêl û bi hêsanî nînin. Herwiha teqez kir ku pêşketin û destketiyên heyîn hemû, bi berxwedan û şerê lehengî yê 37 salan hatine afirandin û li ser van deskeftiyan dikevin sala 38'an ya 15'ê Tebaxê.

Duran Kalkan da diyarkirin ku, têkoşîna 37 salan bi saya fikir û felsafeya Rêber Apo ya politik-îdeolojik bi ser ket û diyar bû ku, serkeftina azadiya gelan wê li ser vê xetê çêbe.

Kalkan got, teqez her şer û serketin xwedîberdêl e, lêbelê ji bo serketin bi berdêleke kêmtir bê bidestxistin, kêmayiyên me hene. Rexneyên Rêber Apo li vê yekê ne. Rêber Apo teqez nabêje 'hûn çima şer dikin, çima ewqas wêrekî û fedakariyê dikin'. Vê yekê her tim bi rêzdarî pêşwazî dike, teqdîr dike. Jixwe ev yek ji aliyê wî ve hatiye afirandin. Lê dibêje, 'bi têkoşineke pir xurt û bi berdêlên herî kêm serkeftin mûmkin e.' Encamên ji aliyê Rêbertiyê ve hatîn afirandin, hemû bi têkoşîna mezin ya gerîla derketine holê. Çi ne ev encam? Ji Kurdê bûyî fosîl, vegera li Kurdên azad; jin, ciwan, civak bi temamî gihîştine asta civaka azad. Me şoreşên mezin yên kesayetê, zêhniyetê û wijdanê pêk anîn. Niha jî her kes hêza fikrên Rêber Apo nîqaş dike. Hewl didin ku fêhm bikin ka ev fikir çawa dikare evqas bandorê li kesayet û civakê bike û vediguherîne. Ev encamên fikra Rêber Apo û pratîka gerîla ya bi vê fikrê ye.

### Li seranserê cîhanê wê êdî serdema gerîla dest pê bike

Kalkan da zanîn ku, li Kurdistanê berxwedana çekdarî rola xwe lîstiye û encamên girîng hatine bidestxistin û got, eger idîa, wêrekî û fedakarî dewam bike, di xeta fedayî ya heyî û berxwedana gerîla de israr hebe; ji pêşketinên leşkerî, siyasî, civakî û îdeolojîk yên heyîn qat bi qat zêdetir wê pêşkeftin çêbin. Rêber Apo gotibû, 'Ev hê destpêk e, hûn li ya ji niha û pêve binerin'. Em jî dibêjin, ya heta niha hatî kirin dikare weke gavên destpêkê bê dîtin. Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê wê bandoreke mezin li seranserê Rojhilata Navî û cîhanê bike. Li seranserê cîhanê wê êdî serdema gerîla dest pê bike. Wê her kes xwe li ser xeta gerîla biparêze. Ji ber ku artêşan nikarî kesî biparêze, têk çûn. Xwarin, vexwarin, gel şelandin. Lêbelê encama ku bi xwe re anîn hilweşandin bû û ev jî bêzariya parastina sîstema wan e. Ev hêz weke encameke jirêderketinê ya dîrokî ye. Encamên derketine holê, baştir nîşan didin ku artêş û dewlet jirêderketin e. Rêxistinên berûvajî mirovayiyê û civakê ne.

Kalkan axaftina xwe wiha domand: "Me li dijî êrişên ser gelê xwe û tevgera xwe li ber xwe da û li dijî paşverûtiya sîstema cîhanê şer kir. Ji ber vê yekê encamên ku îro derketine holê, cîhanê bi temamî eleqedar dikin û bandorê lê dikin. Ya ku di nava vî şerî de ji hev dikeve sîstema modernîteya kapîtalîst e; sîstema desthilatdar, nijadperest û dewletperest e."

### Pêngava şoreşgerî ya azadiyê ya apoyî dest pê kiriye

Kalkan teqez kir ku eger pergala Rêber Apo ya ji bo azadiya jinê baş bê fêmkirin; li gorî vê têkoşîn bê meşandin, wê gerîla êdî ji sînorên Kurdistanê derbas bibe û di xeta azadiyê ya jinê de, bindestan hemûyan bigihîne rizgariyê. Herwiha da zanîn ku kesên bawerî bi serkeftina vê tevgerê naynin û li kêleka dagîrker û dijminê Kurdan cih digirin, li hemberî têkoşîna gerîla di binê hezîmeta xiyanetê de dimînin.

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Duran Kalkan di dawiya axaftina xwe de bang li ciwana kir û wiha got: "Berpirsyariya ciwanên Kurd heye ku vê pêvajoyê fêm bikin û pêwîstiyên wê bi cih bînin. Em di pêvajoya şoreşê de ne. Divê her kes demê baş binirxîne û tevlî vê pêngava mezin bibe û li vê şoreşa pîroz xwedî derkeve."

# Kurd bi têkoşîna xwe li seranserê cîhanê hatin naskirin

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Doktor Celal Mele: Ti hêz bê ku hesabên berjewendiyên xwe bikin, ti alikariyê bi Kurdan re nakin û eger em Kurd yekîtiya xwe ya neteweyî çêkin, pêwîstiya me bi alîkariya ti hêzên derve namîne.**

Doktor Celal Mele Hacî ku ji rojavayê Kurdistanê ye, nêzî 43 salî ye li Amerîka dijî. Doktor Celal têkildarî nêrîna gelê Emerîka li kurdan ya berî şoreşa Rojava û piştî şoreşê ev nirxandin kir: "Piştî destpêkirina şoreşa Rojava, Kurd ji aliyê gelê Amerîka ve pirtir hatin naskirin. Çimkî berî şoreşê ti kesî nizanîbû ka Kurd çi ne û çi dikin. Bi hezarê salan e Kurd li ber xwe didin û têkoşînê dikin. Lê li welatên derve baş nedihatin naskirin. Piştî ku şoreş li Rojava hat destpêkirin, rojbiroj Kurdan li cîhanê deng veda û rola xwe lîstin. Li Amerîka jî, berî ku şoreş dest pê bike ti kesê girîngî nedida Kurdan. Lê dema ku DAIŞ derbasî herêmên Kurdan bû, ku ti hêzan nikariya li hemberî wê şer bike, Kurdan li dijî wan şer kir û li ber xwe dan heta ku DAIŞ têk birin. Ji ber wê ev şoreş û têkoşîna Kurdan li seranserê cîhanê hat xuyakirin. Bi vê têkoşînê, li Amerîka jî nav û dengê Kurdan derket û her kes gihîşt wê baweriyê ku Kurd ji bo mirovayiyê şer dikin û xwediyên hêz û baweriyeke mezin in. Ji wê demê ve Amerîka têkîliya xwe bi Kurdan re çêkir. Rojbiroj ev têkîlî zêdetir bû û bi vî awayî Kurdan nûnertiya xwe li Emerîka jî vekir.

Hacî bal kişand ser rola Amerîka y li bakur û rojhilatê Sûriyê û axaftina xwe wiha domand: "Amerîka niha ji Efxanisatanê vedikişe, dibe ku ji Iraqê jî vekişe. Ev jî bi gelên bakur û rojhilatê Sûriyê re gumanan çêdike û her kes dibêje 'wê rojekê Amerîka ji vir jî vekişe. Lê ez ne bawer im ku dev ji Rojava berde, çimkî planên wê li ser xaka Rojava hene. Ji ber wê nikare dev ji berjewendiyên xwe berde. Amêrîka li Rojava li milekî qaşo alîkariyê dide Kurdan, lê her tiştî li gorî berjewendiyên xwe dike."

### `Çima heta niha Amerîka statûya Rêveberiya Xweser qebûl nekiriye?`

Doktor Celal Mele Hacî got, heta ku yekîtiya Kurdan çênebe, ne Amerîka ne jî dewletên din statûya Rêveberiya Xeser



Qebûl nakin û axaftina xwe wiha qedand: "Eger Kurdên me xwe bidin hev û bibin yek wê demê wê pêwîstiya me bi alîkariya ti kesî tinebe. Divê bawerî bi hêzên derve neyê û heta yêkîtiya me çênebe, ti hêz statûya Kurdan qebul nakin. Dewleta tirki ya faşîst li hêviya Emerîka ye ku xwe ji bakur û rojhilatê Sûriyê vekişîne. Da ku bi hêsanî dagîrkeriya xwe li ser Kurdan pêk bîne. Ji bo wê eger yekîtî çênebe wê bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha başûrê kurdistanê jî têk herin û wê Kurd tev werin qirkirin."

## Ji nêz ve



### 15ê Tebaxê û Rojava

**Ednan Mustafa**

Em di salvegera 37. de pêngava Vejîna 15 Tebaxê dijîn. Ev tê weteya ku beriya 37 salan hêvî û arzûyên gelê Kurd li Kurdistanê ku hatine çandin, niha ne tenê gelê Kurd civaka ku li Kurdistanê dijîn bi wan hêviyan mezin bûn û îro bi saya pêngava vejînê tam û bêhna azadiyê dike. Her çiqas 15ê Tebaxê weke çalekiyeke leşkerî tê pênasekirin û fîşeka yekê li dijî dagîrkeriyê hatibe teqandin jî, lê di esasê xwe de 15ê Tebaxa 1984an, xwedî xisleteke cuda ye. Bi qasî pêngaveke leşkerî be, bi qasî wê yekê pêngaveke îdolojîk û siyasî ye. PKK'ê bi vê pêngavê ne tenê li bakurê Kurdistanê, li Rojhilata Navîn giştî û li parçeyên din yên Kurdistanê li hemberî faşîzmê dîwarê tirsê hilweşand û hêviya jiyan û azadiyê afirandiye.

Bêguman têkoşîna azadiyê li Kurdiatanê û Rojhilata Navîn, li ser mîrasa pêngava vejînê ya 15'ê Tebaxê tê meşandin. Lewra nirxandina destkeftiyên li Rojava û pêngava 19ê Tîrmehê jî yek ji berhem û keda 15'ê Tebaxê ye. Şoreşgerên Kurdiatanê bê ku dudiliyê jiyan bikin bi beweriyeke xurt û di zanabûna ku ev pêngav wê li Kurdistanê mayînde be dest bi têkoşînê kirin. Di serî de keda fermandar Egîd-Mehsum Korkmaz, keda hemû şehîdên azadiyê em gihandine vê rojê. Çawa ku fermandar Egîd li Eruh û Şemzîna ev pêngav dest pê kirin û bû lehî û herikî, termandar Xebat Dêrîk jî bi destpêkirina şoreşa Rojava weke berdewama keda 15 Tebaxê dest bi artêşbûnê kir. Di wê weteyê de, dema em bêjin "Şoreşa Rojava berdewama mîrasa 15 Tebaxê ye" ne şaş e. Lewra di hişemendiya şoreşgerî ya Fermandar Egîd de xuliqkarî, yê kevin hilweşandin û jinûveavakirin hebû. Li Rojava jî ev yek tê dîtin.

Çawa ku 15'ê Tebaxê armanca wê avakirina artêşeke şoreşgerî bû ev artêş li hemberî dagîrkerî, faşîzm û zilmê şer bike. Di bingehê şoreşa Rojava de jî avakirina artêşeke bi hêzê li ser hîmê parastina rawa bû ku ne tenê li hemberî dagîrkeriya Tirkan û faşîzma Ereban û şer bike, herwiha bi artêşa şoreşgerî li hemberî hêzên tarî û tundrew ya ku dagîrkeriya Tirkan piştgiriya wê dike şer kir û Rojava ji tarîbûnê ber bi azadiyê ve bir. Di vê maneyê de, me mûmkin e ku em destkeftiyên bakurê Kurdistanê, başûr û rojavayê Kurdistanê ji hev cuda bigirn dest û binirxînin. Lewra çavkaniya hêzê û moralê vedigere pêngava 15'ê Tebaxê ya sala 1984an. Têgîna parastinê û li ser hebûna îradeya civaka Kurd ku pêngava 15 Tebaxê hatiye avakirin, wisa nirxandin û fêmkirin watedar dibe. Vejîna 15 Tebaxê bi qasî ku çalakiyeke êrişê bû bi qasî vê yekê jî çalakiya parastina rewa û xwedîderketina vîna gelê Kurd bû. Şewq û zindîbûna pêngava vejînê ya 15'ê Tebaxê, li rojavayê Kurdistanê jî ronî da. Bi qasî roniya vê gavê li Rojava bû, civaka li Rojava jiyan dike jî xwe beşek ji vê pêngavê dît. Ji ber gelê Rojava ev pêngav di roniya perspektîfê rêber APO de ji nêz ve dişopand û di nava amedekariya wê de xwedîrol bûn. Li kêleka xwebexşînbûna ciwanên Kurd li Rojava ku qefil bi qefil beşdarî şoreşa vejînê ya 15'ê Tebaxê dibin, bi imkanên xwe yên mitewazî piştgiya madî û manewî kir. Ji ber parçeyê herî piçûk yê Kurdistanê Rêber APO, şoreşga azadiyê û Pengava 15'ê Tebaxê yê xwe dît. Ji bo vê yekê weke çand û xwedîderketin li keda 15'ê Tebax'ê û Keda rêber APO ji Gelê Rojava re dibêjin gelê ku Rêber APO we perwerde kiriye û Başûrê Piçûk (Rojava) weke qada Serokatî tê pênasekirin.

Bi vê hişemendiyê 15 Tebaxê careke din em bîr tînin û ji berê bihêztir xwedî li nirxên şoreşê û Pêngava Vejînê ya 15'ê Tebaxê derkevin.




# `15ê Tebaxê çiraya Kurdan pê ket`

15`ê Tebaxa 1984'an bi têkoşîn û berxwedana Mezlûm û Egîdan jiyana Kurdan ronî bû. Tevî ku ne dîrokeke pir dirêj e, lê di nava vê dîrokê de têkoşîneke pir mezin hat kirin. Têkîldarî mijarê Idrîs Serhed got, pêngava 15ê Tebaxê ji Kurdan re dîroka tolhildanê bû.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Idrîs Serhed got, berî 15ê Tebaxê seranserê Kurdistanê di işkenceyê de bû û axaftina xwe wiha domand: "Li her derê û li her bajarî Kurd di binê tehdîdê de bûn, her devera Kurdistanê weke zindanê bû. Berî destpêkirina Tevgera Azadiyê, Kurdan xwe nas nedikir. Yên xwe nas dikirin jî şerm dikirin xwe bidin nasin. Çimkî tirseke mezin li ser Kurdan hebû û derfetên wan yên xweparastinê nebûn. Kurd li her deverê ji mafê xwe mabûn pêpar. Wê demê Kurdan digot, 'qedera me ye ku em wiha bijîn.' Lê bi derketina PKKê re Kurdan xwe nas kir û gihîştin wê baweriyê ku dikarin têkoşîn bikin. Herwiha bi vê tevgerê re baweriya Kurdan ya bi xwe zêde bû. Vê baweriyê bandoreke mezin li her çar parçeyên Kuristanê kir. Wê demê berxwedana zindanan dest pê kir. Ev jî ji dewleta tirkî ya faşist re weke derbekê bû. Herwiha bi vê tevgerê û bi ruh û fedekariya rêber Abdullah Ocalan, gelê Kurd hat ser hişê xwe."

Serhed bîr xist ku 15`ê Tebaxê ji bo Kurdan dîrokeke nû bû û wiha got: "Eger pêngava 15'ê Tebaxê bi ser neketibûya ne gelê Kurd tenê, mûmkin bû Rojhilata Navî tev bikeve aloziyeke kûr. Herwiha bi vê pêngavê hêviya çiyayên Kurdistanê û gelê Kurd mezin bû. Ji ber wê 15'ê Tebaxê ne li Kurdistanê tenê li seranserê cîhanê guhertin çêkir. Berî wê demê li her deverê şkestin hebê, li çiyayên Kurdistanê tevera azadiyê tenê di tevgerê de bû. Herwiha piştî pêngava 15'ê Tebaxê, tevgera ciwanan di hundirê welat de zêde bû. Lewra ruhê 15'ê Tebaxê ruhê zindana Amedê bû. Ev pêngav bi banga Mazlum Dogan, çalakiya Kemal Pîran û keda Rêber Apo, herwiha bi ruhê Egîdan nirxekî şoreşgerî ava kir. Her çiqas zehmetî hatin kişandin, lê li hemberî dijmin û kesên xiyanetkar ked û têkoşîn hat kirin. Şehîd Egîd bi pêngava 15'ê Tebaxê mohra xwe li şoreşê da û bû mînaka têkoşîna gelê Kurd. Herwiha wê rojê de çiraya Kurdan careke din pê ket."



Idrîs Serhed wiha berdewamî da axaftina xwe: "Têkoşîna PKKê ya pergala xeta sisiyan bû xeta serdemê ya şoreşgerî. Ji bo wê dewleta tirkî ji wê demê ve her rê û rêbaza qirêj li ser me Kurdan pêk tîne. Niha jî ji her alî ve Kurdistanê dorpêç dike da ku Kurd bêmaf bin. Dagîkirina Serê Kaniyê û Efrînê jî, bi armanca tinekirina têkoşîna 15ê Tebaxê hat kirin. Li kêleka vê gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi ruhê 15'ê Tebaxê û li ser xeta Egîd û Zîlanan, li dijî dijmin şer û têkoşînê dikin. Em jî dibêjin pêngava 15ê Tebaxê bû pêngava serkeftina civakê. Şoreşa niha li bakur û rojhilatê Sûrî jî, bi ruhê 15ê Tebaxê dewam dike. Ji bo wê pêngava 15ê Tebaxê gihîşt armanca xwe ya dîrokî."

Idrîs Serhed da zanîn ku di pêngava 15ê Tebaxê de baweriya bi jinê jî mezintir bû û axaftina xwe wiha qedand: "Di vê pêngavê de hevalên jin yên weke Sakîna Cansiz, Çîçek Sercan, Rûken û yên mîna wan roleke mezin lîstin. Ev guhertin û bawerî bûn sedem ku gelek keçên me yên ciwan jî tevlî têkoşîna jinê bibin û di nava refên gerîla de çiyayên azad biparêzin. Heta niha jin bi ruhê vê pêngavê têkoşîna xwe didomînin û bi wî ruhî têkoşina azadiya jinê bi ser ket."

# `Gelê Kurd li kû be Tirkiye êriş dike`

**Navenda nûçeyan**

**Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û başûrê Kurdistanê didomin. Ji bilî êrişan, gelek guhertinên demografîk li bajarên dagîr kirîn çêdike û siyaseta xwe ya qirêj li ser kurdan pêk tîne.**

Her kes dibîne ku Tirkiye bi rê û rêbazên xwe yên qirêj û bi awayekî hovane êrişên qirkirinê li ser Kurdan pêk tîne. Berî çend rojan jî malek li Eyn Îsa topebaran kir. Di encamê de çar kes ji wê malbatê hatin kuştin. Heman demê her roj sûcên dijmirovî li Efrîn û Serê Kaniyê dike. Di 14'ê Tirmehê de jî li Efrînê gorên 35 şehîdan vekirin û gotin, ev gorên komî yên bêxwedî ne û heta niha jî nayê zanîn ka ew cenazeyên şehîdan bi kû ve birine.

### `Em li hemberî êrişên qirkirinê bêdeng namînin`

Derbarê mijarê de hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Zelal Ceger got, dewleta tirkî êrişên pir dijwar bi ser Kurdan de tîne û axaftina xwe wiha domand: " 2023'yan sedsala Peymana Lozanê temam dibe. Ji bo wê Erdogan dixwaze hem li bakur û rojhilatê Sûriyê hem li başûrê Kurdistanê, li gorî sedsaliya Peymana Lozanê van herêman bixe binê kontrola xwe. Jixwe armanc ew e ku berî ku sedsaliya Peymana Lozanê temam bibe, çareke din van bajar û herêman bi dest bixe. Çimkî berî ku parçebûn çêbe başûr û rojavayê Kurdistanê di binê kontrola Tirkiyê de bûn. Ji bo wê jî her tim li ber çavên wê ye ku Başûr, Rojava wek serdema Osmaniyan dîsa bêxe binê dagîrkeriya xwe. Herwiha bidestxistina van herêman her tim jê re weke xewenekê ye. Ji ber wê bi şev û roj êrişên xwe li ser Kurdan pêk tîne. Berî çend rojan jî malek li Eyn Îsa topebaran kir û çar kes ji malbatekê şehîd bûn. Ev êrişên hovane ku bi armanca qirkirina



Kurdan tên kirin dijmirovî ne, em li hember bêdeng namînin û emê têkoşîna xwe xurttir bikin."

Ceger diyar kir ku di şexsê Rêber Apo de êrişên qirkirina Kurdan zêde dibin. Herwiha da zanîn ku bi tecrîdê jî sistema işkenceyê li ser Rêber Apo heye, ev jî bi heman armancê tê kirin û got, êriş ne li ser gel tenê hene, tecrîdeke giran li ser rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan heye. Dixwazin bi vê tecrîdê rêbertiyê ji gel qut bikin. Lewra ji bo wan metirsiya herî mezin fikir û ramanên rêbertiyê ne."

Zelal Ceger da xuyakirin ku dewleta Tirkiyê ya dagîrker, beşeke mezin ji Erdnîgariya rojavayê Kurdistanê dagîr kiriye û axaftina xwe wiha domand: "Wek ku tê dîtin dewleta tirkî herêmên rojavayê kurdistanê (Serê Kaniyê û Efrîn) dagîr kirine û guhertina demografîk dike. Herwiha gelê ku li wir mane jî, xistine nava zindanê û jiyan ji wan re kiriye işkence. Ne li Rojava tenê, li başûr û bakurê Kurdistanê jî heman plan û kiryar tên meşandin. Berî demekê jî tevayiya şehîdên li Efrînê ji gorên wan derxistin û heta niha jî ne diyar e ka bi kû ve birine."

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Zelal Ceger gotinên xwe wiha bi dawî kirin: "Her tim daxwaziya dewlata tirkî ya faşîst ew e ku gelê Kurd tine bike. Êrişên xwe yên hovane ji her alî ve dike. Dixwaze vî gelî ji her aliyê jiyanê ve qir bike. Ji bo wê şerê teybet di asta herî jor de dimeşîne. Çimkî armanca wan ya sereke tinekirina gelê Kurd e. Ji ber wê gelê Kurd li kû be ew êriş dike."



## DENGÊ ÇEKA EGÎD

**Faruk SAKİK**

Rêber Apo di parêznameyên xwe de 15'ê Tebaxa 1984'an analîz dike û îşaret bi guhertinên di civaka Kurd de dike. "Eger xeta îdeolojîk û polîtîk ya PKK'ê û şerê gel yê jê re pêşengî kirî rast nebûya, dîrok û çanda Kurd rast nîşan nedabûya, wê Kurdan nikaribûya hebûna xwe bidomîne..."

Piştî serhildanan, dijminên dagîrker ji bo ku Kurd careke din, ji bo hebûn û azadiya xwe serî li çekan nedin, siyaseteke taybet meşandin.

Aqûbeta kesên serî li çek dayîn, bi darvekirin û sirgûnan dawî bûbû. Car caran bi zanebûn pêşî li hin tevgerên doza Kurdistanê dikirin jî vekirin. Van rêxistinan di paradîgmaya xwe de çek bi cih nekiribûn. Ji bo vê yekê jî di nava civaka Kurdan de bersiv nedidîtin.

Jixwe di wê demê de gelek kom û kesayet bi heman idîayan nêzî pirsgirêkê bûn, lê ji ber ku hemû li dîrok û çanda Kurd rast xwedî derneketin, ji tasfiyeyê rizgar nebûn.

Koma Apociyan dema ku ji Enqerê bi rê ket ev çek li gel wan bû. Rêber Apo rola çek baş nirxandibû û gihîştibû encamekê: 'Civaka Kurd ya hatibû binaxkirin û tinekirin encex bi çek ji nûve zindî bibûya.'

Di destpêkê de li Siwêrek, Hilwan û piştî şehadeta Hakî Karer jî, ji bo tola wî deng bi çekan ket. Vî dengî hêdî hêdî berê ciwanan da nava vê tevgerê.

Piştî derbeya 12'ê Îlona 1980'yan, tevgera azadiyê derbasî Rojhilata Navîn bû. Li vê derê dest bi amadekariya vegera welat û destpêkirina şerê çekdarî kir.

Li Kurdistanê bêdengiyê dest pê kiribû. Ji bo hişyariyê pêdivî bi çekê hebû. Fermandar Egîd-Mahsûm Korkmaz dema ku li herêma çiyayê Gabar peyama çalakiyê da, êdî ew dem hatibû.

Di 15ê Tebaxa 1984'an de dema li Eruh deng bi çekan ket, bêdengiya darbeya 12'ê Îlonê parçe parçe bû. Ji her devera Kurdistanê ciwan ber bi vê çekê ve derketin ser rê. Li çiya û di şiveriyan de ketin dûv şopa pêlavên Mekapê. Di nava van rêwiyên ber bi çiyayên azad ve dimeşiyan de, jinên Kurd jî hebûn. Çeka Egîd girtibûn û şer dikirin. Roj hat van jinên Kurd artêşek jî ava kir.

Ciwan hatin bûn gerîla û malbatên wan jî, li deşt û bajaran rabûn serhildanê. Dengê çeka Egîd gihîştibû hedefa xwe û êdî bêhna azadiyê û barûdê bi hev re li axa Kurdistanê belav dibû.

Lê dijminên Kurdistanê bi Tirkiye, Iraq, Îran û Sûrî ne sînorkirî bûn; dewletên Ewropa, Rûsya, Amerîka jî li kêleka van dijminan cih girtibûn. Kompoloya navneteweyî dan destpêkirin, lê dîsa jî nikaribûn pêşî li dengê çeka Egîd bigirin. Êdî gerîlayên Egîd bûbûn gerîlayên hemdem.

Çeka di destê gerîla de bi lehengiyeke mezin bersiv dida her êrişê. Çeka di destê şervanên YPG û YPJ de jî çeteyên weke DAIŞê ku dijminên mirovayiyê bûn, paqij kiribûn. Ji vê lehengiya gerîla û şervanên Kurd re cîhanê tevê şahidî kir.

Îro jî dewleta Tirkan ya dagîrker ji bo gerîla bêçek bike êrişî herêmên parastinê yên Medya dike. Ji kû derê dengê çekan bilind bibe êrişî wê derê dike. Ew jî baş dizane, li hemberî dagîrkirina Kurdistanê yek navenda parastinê ev der e. Îro jî hevalên Egîd li Zap, Metîna, Avaşîn û Zagrosan li hemberî çek û teknolojiya herî pêşketî ya dijmin destanan dinivîsin.

Piştî pêngava 15'ê Tebaxê bi rojekê, rayedarên dewleta Tirkan daxuyanî dan û gotin; di 24 saetan de emê dawî li PKK'ê bînin. Nebû... Lê dengê çeka Egîd, dawî li gelek hikumetên dewleta Tirkan anî. Ev 37 sal in dengê çeka Egîd hê jî bênavber li asîmanên Kurdistanê bilind dibe.